Li Tirkiyeyê du hefteyên dawîn

1-15 Mijdarê, 2022

**4ê Mijdarê, 2022**

**Parêzera ku got divê îdiayên der barê çekên kîmyewî de bên lêkolînkirin serbest hat berdan**

Parêzer Aryen Turan di Ciwana Giştî ya Asayî ya Baroya Îzmîrê de ku di 22ê Cotmehê de pêk hat axivî. Di axaftina xwe de xwest ku der barê çekên kîmyewî de lêpirsîn bê vekirin. Ji ber axaftina xwe hat girtin. Endama Komeleya Hiqûqnasên Azadiyê (ÖHD) Turan, di axaftina xwe de her wiha bi dirûşma "Jin, Jiyan, Azadî" Mahsa Amînî bi bîr anî ku li Îranê bi hinceta rêgezên hicabê binpê kiriye, hatibû binçavkirin û qetilkirin.

Li ser vê axaftinê Serdozgeriya Komarê ya Îzmîrê lêpirsîn da destpêkirin. Aryen Turan a ku di êvara 3ê Mijdara 2022an de hat binçavkirin, 4ê Mijdarê danê sibê sewqî Edliyeya Îzmîrê hat kirin. Îfadeya wê ji aliyê dozgeriyê ve hat girtin û bi daxwaza ku bi şertê kontrola edlî bê berdan sewqî Dadgeriya Cezayê ya Sulhê hat kirin. Turan bi şertê qedexeya derketina derve û kontrola edlî hat berdan.

**5ê Mijdarê, 2022**

**Midûriyeta Ewlekariyê ya Diyarbekirê belavkirina rojnameyên kurdî asteng kir**

Polîsên sivîl ên girêdayî Midûriyeta Ewlekariyê ya Amedê belavkirina rojnameya hefteyî ya bi navê Xwebûn asteng kir. Xwebûn rojnameyeke hefteyî ya bi Kurdî ye.

Rojname bi kargoya otobusê Ji Diyarbakirê bo Stenbolê ve tê şandin. Polîsan belavkarê rojnameyê li Termînala Otobusan a Diyarbekirê (DIŞTÎ) rawestand û got, “Hûn ê vê rojnameyê negirin. Ger hûn bigirin, em ê otomobîla we girê bidin”, û dû re rojname ji otobusê dan daxistin.

Di 19ê Îlonê de jî polîsan nehişt rojnameyê bişînin Mêrsînê û rojname desteser kirin.

**7ê Mijdarê, 2022**

**Hejmara rojnamegerên girtî derket 68an.**

Expression Interrupted ku girêdayî Platforma Rojnamegeriya Serbixwe (P24) ye, heftemîn rapora “Rojeva Azadiya Îfade û Çapemeniyê” weşand. Rapor mehên Tîrmeh, Tebax û Îlona sala 2022an vedihewîne.

Li gorî raporê di van 3 mehan de di 51 dozan de 73 rojnameger hatin darizandin. Di 10 dozan de li 11 rojnamegeran bi giştî 30 sal û 11 meh û 11 roj cezayê girtîgehê hat birîn. Herî kêm 23 rojnameger di dema şopandina nûçeyan de rastî tundiya fizîkî û gefên polîsan hatin. Cezayê girtîgehê ku li rojnamegerekî hat birîn, bi 10 hezar û 110 TL cezayê pereyî ve hat guhertin.

Der barê 14 rojnamegeran de 9 dozên nû hatin vekirin. 11 rojnameger û xebatkarên çapemeniyê hatin binçavkirin. Hejmara rojnamegerên girtî ku di dawiya çaryeka duyemîn a 2022an de 67 bû, derket 68an.

**8ê Mijdarê, 2022**

**Polîsan êrîşî daxuyaniya çapemeniyê kir**

Ji bo protestokirina projeya rêya ku dê daristana ODTUyê bike du parçeyan, li ber avahiya Şaredariya Bajarê Mezin a Enqereyê (ABB), bi beşdariya xwendekar, akademisyen û mezûnên Zanîngeha Teknîkî ya Rojhilata Navîn (ODTU) û gelê Enqereyê daxuyaniyeke çapemeniyê hat dayîn.

Ji xwendekarên ODTUyê ku daxwaza betalkirina projeyê kirin, 6 kes piştî daxuyaniya çapemeniyê hatin binçavkirin. Di dema binçavkirinê de polîsan gaza bîberê bikar anîn û tundiya fizîkî pêk anîn. Di nav kesên ku hatine derbkirin de 2 rojnameger jî hene ku daxuyanî dişopandin. Polîsan dîmenên ku ji aliyê rojnamegerekê ve hatibûn kişandin jî bi zorê jêbirin.

**9ê Mijdarê, 2022**

**Cîhan Kolîvar ê Serokê Sendîkaya Hilberînerên Nanî hat girtin**

Di nûçeyekê de hat ragihandin ku nanpêjvan bi hinceta zêdebûna lêçûnan dê êdî nên bi 7,5 TLyan bifiroşin.  Li dû nûçeyan, Serokê Sendîkaya Hilberînerên Nanî, Cîhan Kolîvar daxuyaniyek da û di 8ê Mijdara 2022an de hat binçavkirin. Kolîvar îro piştî ku îfadeya xwe da hat girtin.

Piştî biryara bilindkirina bihayê nên, Kolîvar daxuyanî da û got, "Çi hikûmet çi jî Serokomar nikare pêşî li vê yekê bigire". Piştî vê daxuyaniyê, Cîhan Kolîvar di weşana zindî de tevlî bernameya Afşîn Yurdakul a HaberTurk TVyê bû û got, “Nan, xwarina bingehîn a civakên ehmeq e. Ji ber ku civaka me bi nan têr dibin, 20 sal in rêveberên wiha li serê wan e."

Berdevkê AKPê Omer Çelîk li ser hesabê xwe yê twitterê rexne li Kolivar girt û got, "Gotinên Serokê Sendîkaya Hilberînerên Nanî, Cîhan Kolîvar gotinên nefretê ye." Piştî daxuyaniya Çelîk bi 3 saetan, Serdozgeriya Komarê ya Stenbolê li gorî xala 301/1 a TCKê lêpirsîn da destpêkirin û der barê Kolîvar de biryara binçavkirinê derxist. Kolîvarê bi îdiaya "bi eşkere heqaret li neteweya tirk, dewleta Komara Tirkiyeyê, Meclisa Mezin a Tirkiyeyê, hikûmeta Komara Tirkiyeyê û saziyên dadweriyê kiriye" hat binçavkirin.

Piştî biryara girtinê, parêzerê wî ragihand ku girtina Kolîvar ne girêdayî îfadeyên wî yên der barê nên de ye, lê ji ber parvekirinên xwe yên berê yên li ser Twitterê, bi tohmeta “heqaret li Serokomarkiriye” hatiye girtin.

**Doza Adalet Kayayê**

Di rûniştina doza parêzvana mafên jinan û Seroka Komeleya Jinan a Rosayê,  Adalet Kayayê de, biryar hat dayîn ku di rûniştina pêş de nêrînek were amadekirin.

Adalet Kaya ji ber xebatên xwe yên ku wekî seroka komeleyê pêk anine, daxuyaniyên xwe yên çapemeniyê û hevdîtinên ku beşdar bûne, bi hinceta “endamtiya rêxistina terorê” tê darizandin. Şeş dosyayên der heq Kayayê de hatine amadekirin bûn yek. Piştî yekkirina dosyayan darizandina wê dest pê kir. 6emîn rûniştina dozê di 11emîn Dadgeha Cezayên Giran a Diyarbekirê hat dîtin. Ji bo ku

serdozgerê komarê nêrînê amade bike û kêmasiyên din ên pêwîst ji holê rake doz taloqî 6ê Adara 2023an hat kirin.

**Dozger xwest ku cara duyem ceza li Sirri Sureyya Onder bê birîn**

Li wekîlê berê yê HDPê Sirri Sureyya Onder, bi îdiaya ku "heqaret li dewlet û hikûmetê kiriye" 5 meh cezayê girtîgehê hatibû birîn. Eşkerekirina biryarê hatibû taloqkirin.

Onder di vê dozê de ji ber du axaftinên xwe dihat darizandin.

Onder di 20ê Gulana 2016an de piştî ku parêzbendiya wî hat rakirin hat binçavkirin. Axaftina wî ya ewil di îfadeya ku li dozgeriyê dabû de derbas dibû. Onder ji ber gotina xwe ya "Raboriya Erdogan gumanbar e" hat darizandin û bi hinceta "heqaret li Serokomar kiriye" hat cezakirin.

Serdozgeriyê idîa kir ku cara ewil ji ber peyva “gumanbar” ceza li Onder hatiye birîn. Lê di dawiya axaftina xwe de Onder gotiye “Erdogan ferman daye û ev darizandin dest pê kiriye” û bi vê yekê heqaret li organên darazê kiriye û vê carê ji ber van gotinan divê bê darizandin. Lê belê dadgehê biryar da ku cezayê ku tê xwestin mukerer e. Onder di 5ê Mijdara 2022an de di mîtînga li navçeya Rezan a Diyarbekirê pêk hat de axaftinek kir. Dadgehê ji ber hin îfadeyên ku di vê axaftinê de anîne ziman,  5 meh cezayê girtîgehê li Onder birî.

**Doza Endamên Lijneya Rêveberiyê ya Baroya Enqereyê**

Alî Erbaş di xutbeya înê ya 24ê Nîsana 2020an de takekesên LGBTI+ û kesên bi HIVê dijîn wekî hedef nîşan da.  Baroya Enqereyê bi daxuyaniya çapemeniyê ew rexne kir. Ji ber vê daxuyaniyê li serokê Baroyê yê wê demê Erinç Sagkan û endamên Lijneya Rêvebiriyê bi îdiaya ku "heqaret li memûrekî dewletê kirine" doz hat vekirin. Yekemîn danişîna dozê di 15ê Kanûna 2021an de li 16emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê hat dîtin. Di danişîna sêyemîn a di 9ê Mijdara 2022an de pêk hat de parêzerên bersûcan diyar kirin ku ji ber ku lijneya dadgehê ya esasî ku dozê bi rê ve dibe, li wir ne amade ye, dê di rûniştina pêş de parastina xwe bikin. Danişîn taloqî 8ê Sibata 2023an hat kirin.

**10ê Mijdarê, 2022**

**Girtiyê bi giranî nexweş, Mehmet Emîn Ozkan ê 83 salî, nehat berdan**

Mehmet Emîn Ozkan ê 83 salî, ev 27 sal in di girtîgehê de ye. Ozkan xwedî pirsgirêkên cidî yên tenduristiyê ye, wekî tansiyona bilind, guatra bijehr, helana hestî, kêmbûna bihîstin û dîtinê û kêmbûna bîrî.  Tevî van nexweşiyan û rapora "Nikare di girtîgehê de bimîne" ya ji aliyê Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Gazi Yaşargilê ve hat dayîn jî, di 28emîn danişîna dozê ya 10ê Mijdara 2022an de nehat tehliyekirin. Saziya Tipa Edlî (ATK) der heq Ozkan de rapor da û got “dikare di girtîgehê de bimîne”. Ev yek bû sedem ku Ozkan neyê berdan.

Mehmet Emîn Ozkan di sala 1996an de li navçeya Licê ya Amedê bi hinceta ku “di sala 1993an de tevlî kuştina Tuggeneral Bahtiyar Aydin bûye” hat girtin. Di rûniştina ewil a dozê de hat mehkûmkirin û cezayê miebedê lê hat birîn. 2 kesên ku der barê Ozkan de îfade dabûn, piştre diyar kirin ku di pêvajoya dadgehê

de îfadeya xwe di bin îşkenceyê de dane. Lê belê cezayê wî yê miebedê ji aliyê Dadgeha Bilind ve hat erêkirin.

Parêzerê Ozkan dosya bir Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (AİHM). AIHMê diyar kir ku hebûna dadwerê leşkerî ya di heyeta dadgehê de "li dijî mafê darizandina adil" e. Li ser vê biryarê Ozkan, li 7emîn Dadgeha Cezayê Giran a Edeneyê ji nû ve hat darizandin. Li gel ku cezayê miebedê hat rakirin jî, daxwaza berdanê hat redkirin. Ozkan ev nêzî 9 sal in girtî tê darizandin. Doz dê di 28ê Sibatê de berdewam bike.

**13ê Mijdarê, 2022**

**Xwendekarê ku ji ber ku nikare heqê xwe bide, ji yurdê hat avêtin dest bi çalakiya rûniştinê kir.**

Xwendekarê Zanîngeha Stenbolê Burak Başer ê ku li wargeha xwendekarên mêran a girêdayî Saziya Kredî û Wargehan (KYK) dima, ji ber ku mehekê nikarîbû heqê wê bide, ji wargehê hat avêtin. Başer piştî ku li ser hesabê xwe yê medyaya civakî bûyer eşkere kir, cara duyemîn ji wargeha ku destûr hatibû dayîn 10 rojan wek mêvan lê bimîne, hat bidûrxistin û paşê li ber wargehê dest bi çalakiya rûniştinê kir.

Başer got, “Ez 850 TL kredî distînim, 375 TLyê wê didim wargehê. Li hêviyê ne ku em bi 400-500 lîreyî debara xwe bikin."

**14ê Mijdarê, 2022**

**Dixwazin jina Îranî ku cezayê darvekirinê lê hatiye birîn, dersînor bikin**

Jina penaber a Îranî ya bi navê Mahşid Nazemî ku li Îzmîrê dijî, di 8ê Mijdarê de ji aliyê rêveberiya koçberiyê bi hinceta ku “îmzeya wê kêm e” hat vexwendin.  Nazemî li wir hat binçavkirin. Mahşid Nazemî xwişka Puran Nazemî ye ku çalakvaneke siyasî ye û li Îranê di girtîgeha Evin de girtî ye. Hat diyarkirin ku Mahşid Nazemî penabera siyasî ye û li Îranê mehkûmê îdamê ye. Ji bo bi paş ve neyê şandin Baroya Aydinê dê wekaleta wê bigire û dest bi xebatên hiqûqî bike.

**Doza Fırat Akdeniz û yên din**

Danişîna duyemîn a doza ku 32 kes bi îdiaya "dijberîkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanan" tên darizandin, di 14ê Mijdara 2022an de, li 10emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Diyarbekirê pêk hat. Di nav van 32 kesan de rêvebirê Komeleya Mafê Mirovan a Diyarbekirê Firat Akdeniz jî heye. Di 17ê Tîrmeha 2017an de komeke ji 50 kesan pêk hatî çalakiya rûniştinê pêk anîn.  Armanc ew bû ku bidûrxistinên bi biryarnameyên di hikmê qanûnê de şermezar bikin. Li dû çalakiyê doz hat vekirin. Dê danişîna bê di 13ê Sibata 2023an pêk bê. Dê dozgerê komarê mitalaya xwe peşkeş bike.

**Doza Caner Perit Ozen û Ersin Berke Gok ên Xwendekarên Zanîngeha Bogazîçiyê**

14 xwendekarên Zanîngeha Bogazîçiyê ku li dijî tayînkirina qeyûman nerazîbûn nîşan dan û xwestin dersên wan rû bi rû bê dayîn, di 4ê Cotmeha 2021an de hatin binçavkirin. Bi hinceta ku “dijberiya Qanûna

Civîn û Xwepêşandanan a hejmar 2911an kirine", "mirov ji azadiyê bêpar hiştine", "nehiştine ku peywirdar peywira xwe pêk bînin" û "dest danîne ser wesayitên bejayî" doz li wan hat vekirin.

Caner Perit Ozen û Ersin Berke Gok di 6ê Cotmehê de hatibûn girtin, piştî ku 94 rojan di girtîgehê de man, hatin berdan.

5emîn danişîna dozê di 14ê Mijdara 2022an de li 27emîn Dadgeha Cezayê Giran pêk hat. Parêzerên bersûcan daxwaza guhertina dadger kirin, lê ev daxwaz hat redkirin. Doz taloqî 30ê Çileya 2023an hat kirin.

**15ê Mijdarê, 2022**

**Der barê Aysel Tugluk de îdianameya nû**

Îdianameya der barê Parlamentera berê ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Aysel Tugluk de ku 8 sal şûnde hatibû amadekirin, ji aliyê 4emîn Dadgeha Cezayê Giran a Diyarbekirê ve hat qebûlkirin. Ji ber Saziya Tiba Edlî (ATK) der heq wê de rapora ku "nikare di girtîgehê de bimîne" dabû, Aysel Tugluk di 26ê Cotmeha 2022an de hat berdan. Kesê bi navê Turgut T. ku di êrîşa DAIŞê ya bi ser Kobanê de birîndar bûye û tê îdiakirin ku endamê rêxistinê ye, di daxuyaniya xwe de ji serdozgeriya Komarê ya Edeneyê re gotibû ku Aysel Tugluk alîkarîya wî kiriye".  Îdianameya nû li ser vê  îdiayê hat amadekirin.